K.T
ZANINGEHA MÊRDÎNÊ ARTÛKLÛYÊ
ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
PROJEYA QEDANDINÊ YA LÎSANSA BILIND A BÊTEZ

# ÇÎROKÊN GELERÎ YÊN HEREMA XURSA ŞIRNEXÊ Û MOTÎFÊN WAN

Latife ATAY
16721018

Şêwirmend
Alk. Doç. Dr. Mustafa ASLAN

MÊRDÎN - 2018

**K.T**
**ZANINGEHA MÊRDÎNÊ ARTÛKLÛYÊ**
**ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**
**ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**
**PROJEYA QEDANDINÊ YA LÎSANSA BILIND A BÊTEZ**

# ÇÎROKÊN GELERÎ YÊN HEREMA XURSA ŞIRNEXÊ Û MOTÎFÊN WAN

**Latife ATAY**
**16721018**

**Şêwirmend**
**Alk. Doç. Dr. Mustafa ASLAN**

**MÊRDÎN - 2018**

# NAVEROK

NAVEROK ........ i
KURTE ........ iii
ÖZET ........ iii
DESTPÊK ........ 1
1. DERBARÊ TÊGEHA MOTÎFÊ DE AGAHÎ ........ 2
2. DI DERBARÊ MOTÎF ÎNDEKSÊ Û STÎTH THOMPSON DE AGAHÎ ........ 3
3. LÎSTEYA MOTÎFAN ........ 4
3.1. Motîfên Mîtolojîk ........ 4
3.2. Ajel ........ 4
3.3. Qedexe ........ 5
3.4. Sêhr ........ 5
3.5. Mirî ........ 5
3.6. Derasayî ........ 6
3.7. Hût ........ 6
3.8. Ezmûn ........ 6
3.9. Zane û Behle ........ 7
3.10. Xapandin ........ 7
3.11. Berevajîbûna Çarenûsê ........ 7
3.12. Tayînkirina Dahatûyê ........ 8
3.13. Şens û Bext ........ 8
3.14. Civak ........ 8
3.15. Xelat û Ceza ........ 9
3.16. Girtî û Firar ........ 9
3.17. Zordariya Neasayî ........ 9
3.18. Zayend ........ 10
3.19. Xwezaya Jiyanê ........ 10
3.20. Ayîn ........ 10
3.21. Taybetmendiyên Karakterî ........ 10
3.22. Pêkenî ........ 11
3.23. Komên Motîfan ên Curbicur ........ 11

4. ÇÎROK Û MOTÎFÊN WAN ........ 12
4.1. HEMHEMONUK ........ 13
4.1.1. Motîfên Çîroka Hemhemonuk De ........ 14
4.2. HOCÎLUK ........ 15
4.2.1. Motîfên Çîroka Hocîlukê De ........ 16
4.3. GUHRETEL ........ 17
4.3.1. Motifên Çîroka Guhretel De ........ 18
ENCAM ........ 19
ÇAVKANÎ ........ 20

## KURTE

Dî edebîyata gelerî de gelek cûre hene . Ev cûre zugotînok , mamîk , destan, gotînên pêşîyan, biwêj (îdyom), serpêhatî, stran, klam, lawij, lorî, du'a, nifir, xeber ,çîrokan û hwd. pêk tên. Di nav cûreyên edebiyata gelerî de çîrok, gelek taybetmendiyên cûreyên edebiyata gelerî  dîhebînin, lewra pîr cihekî girîng girtine. Jî ber kû çîrok xwedî gelek hêmanin mîrov dîkare weke panaromaya netewekî lê meyzêne .

Jî salên 1800 û vîr de lî ser rûyê dinyayê gelek xebat lî ser çîrokan hatine kirin .Folklornas çîrok weke  xistine laboratiwarê û lî ser analîz kirine . Stîth THOMPSON dî vî warî de folklornasê herî navdar e .  Ev xebata me jî kurte xebateke li ser hin çîrokên kurdî li gorî analîza S. Propp ya li ser motîfan jî xwe re kiriye armanc .Emê jî dî vê xebatê de ? çend çîrokên gundê Xursê kû gîrêdayî Şirnexê yê binirxînin.



**Peyvên Sereke :** Çîrok , Çirokên Xursê,Thompson, Motîf,



## ÖZET

Halk edebiyatında birçok edebi tür vardır . Bu türler tekerleme, bilmece , destan , atasözleri, deyim, mesele ,türkü,klam , lawij , ninni ,dua , beddua , küfür , masal vb. türlerdir. Halk edebiyatı türlerinden masal diğer birçok türü içinde barındırdığından bilhassa önemli bir yer tutmaktadır . Masallar birçok unsura sahip olduğu için onlara bir milletin panaroması gözüyle bakılabilir .

1900'lü yıllardan bu yana dünya üzerinde masallarla ilgili birçok çalışma yapılmıştır . Folklor bilimcileri masalı laboratuvara koyup üzerinde inceleme yapmışlardır . Stith Thompson da bu alanda en çok bilinen folklor bilimcisidir. Bu çalışmamız da  S. Thompson'ın motiflerle ilgili çalışmasını esas alarak bazı kürt masalları üzerinde kısa bir çalışma yapmayı amaçlamaktadır .



**Anahtar Sözcükler :** Masal , Bulmuşlar Köyü Masalları, Thompson, Motif

# DESTPÊK

*Li gorî danasîna Mazi (2014:353), çîrok: "Çîrçîrok: Bûyerên ku ji xeyalên gel derketine û ev bûyer di jiyana rastîn de nayên dîtin an bi temamî an jî hinekî ji jiyana rastîn dûr in. Gelek caran bi kesayetî û bûyerên nedîtî re neqişkirî ne. Bi Tirkî masal, bi 'Erebî mesel tê gotin."*[1]Di nav Kurdan de jî weke meselok ,xeberoşk, çîrçîrok , çîvanok tên bilêvkirin .

Çîrok weke lehîyê ji nav gelê kû hatiye afîrandin taybetmendîyên wê dîde hev û lî ber xwe dîbe . Bî vî awayî nîfşên nû dikarîn jî vê gencîneyê sûd wergirînin û ji ber kû çîrok derasayîbûna dihebînin jîyana guhdarvanên xwe dewlemend dikin. Çîrok hevparîyên netevan nîşanî me didin . Teqez e kû rola motîfan ê kû dî çirokan de jî vî alî gelekî mezin û gîrîng e.

Analîzên li ser çîrokan hatîne kirin ji ber kû rêya nasîna wî netewî li ber me vedikin û jî alîyekî din ve jî hevparî û cudatîyen ên bî netewên din re nîşanî me didin girîng in . Heta niha gelek analîz li ser çîrokan hatîne kirin . Kaarle Krohn, Anttî Aarne , Vladîmîr Propp Û Stîth Thomson navdartirîn analîzen li ser çîrokan kirine . Ev her sê folklornas ji bo polînkirin û tehlîlkirina çîrokan rê û rêbaz pêşberî me kirine . Ji ber kû armanca me motîfên di çîrokan de ye emê analîza Stîth THOMPSON ji xwe re bikin rêber .

Berî me lêkolîner û nivîskarên din jî li ser vê mijarê xebat kirine . Weke kû Bûnyamîn DEMÎR di teza xwe de nîşanî me dide kû Yona SABAR , Veysel TANRIKULU , Ramazan PERTEV , Hayrettîn KIZIL , Hîkmettîn ATTI û M. Şîrîn FÎLÎZ di vî warî de xebatên hêja kirine .Emê jî di vê xebatê de çend çîrokên gundê Xursê li gorî rêbaza S. Thompson analîz bikin û motîfên wan bibînin. Bi vî awayî emê karîbin bingeha çîrokên Kurdî bî şêwazeke zanistî berbiçav bikin û hevparîyên wan di nav çîrokên dinyayê de bibînin. Lewra ev xebata ku em ê bikin wê serencameke ewle û saxlem bide me. Em jî dixwazin kû ev xebat jî zêdebûnekê din di nav xebatên folklora kurdî de çêbike û ji bo folklorhêzan bibe weke çavkaniyekê.

[1] Muzaffer EKİNCİ ,Lêkolîneke Li Ser Lawirên En Kû Di Berhema M. Emin BOZARSALAN Ya Rêzeçîrokên A Bi 'Navê Meselokên Lawiran' Derbas Dibin

# 1. DERBARÊ TÊGEHA MOTÎFÊ DE AGAHÎ

Motîf him di çîrokan de wateya derasayî dide him jî meyla bîrê dide him jî rasterast bandorê li ser çîrokan dike. Lewra veguherînên sosyo-civakî di teşegirtina motîfan de rasterast bandoreke bingehîn werdigire. Loma di vekolîna rêbaza motîfan de ya herî girîng ew e ku meriv bingeha çîrokê vekolîne. Motîf, bingeha herî biçûk ya çîrokê ye. Ji ber vî çendî parçekirina motîfan ji bo mijara me ya li ser çîrokên gelêrî qaîdeyeke girîng e. Berî kû em bî berfirehî lî ser pênaseya motîfê ya Stîth Thompson bisekînîn emê hinekî din têgeha motîfê berbiçav bikin ..

Lî gorî Veseloskî dibêje ; *Di çîrokê de motîf hîmên çîrokê ne lê mîjar pey wan re tê . Motîf dî vegotînê de parçeya herî xurî ye* [2].Têgeha "motîf"ê bi eslê xwe frensî ye . Di gelek qadan de weke resîm . muzîk , mîmarî tê bikaranîn. Bêguman di her qadê de xwedî wateyeke cuda ye . Dî edebîyata gelerî de jî xwedî wateyek cuda ye .

Li gorî Lînda dibêje ; *Motîf tiştên derasayî û tiştên rasteqîn bi hev ve gîrêdidin . Ew wê dinyaya kû di çirokê de tê jiyîn digihîne roja me . Motîf di vegotinên gel de parçeyên herî biçûk ê kû nalivin in .*[3]

Li gorî Ekîcî dibêje *; motîf hêmana di çîrokekê de hêmana herî bîçuk e û dî dahatûyê de xwedî hêza domdarîyê ye . Ji bo kû motîf bibe xwedîyê vê hêzê divê hemana kû dihebîne bêhempa û balkêş be*[4].

Li gorî van pênaseyan em dikarin taybetmendîyên motîfan halo rêz bikin . Motîf ji ber kû domdarîyê dihebînê dihêle kû çîrok hîn bêhtîr berbelav bibe û di bîra gel de mayinde bibe Motîf ji ber kû parçeyê herî biçuk e naye parçekirin. Tîşten asayî nikarin bibin divê kû balkêş û derasayî bin . Bî serê xwe wateyên kûr dihebînin.

[2]V. Propp, Masalin Biçimbilimi, çev. Mehmet Rıfat –Sema RIfat, Türkiye İş YAY. 2. Baskı, İstanbul, 2011, s. 16-17
[3]Serkan Balcı – Yayılım Alanlarıyla Bir Masal ve Versiyonlarının Motif İncelemesi –2014- Kars
[4] Merve Bozdoğan – Türk Halk Hikayelerinde İmtihan Motifi – Niğde-s.39, 2013

## 2. DI DERBARÊ MOTÎF ÎNDEKSÊ Û STÎTH THOMPSON DE AGAHÎ

*Stîth Thompson ji aliyê gelek nivîskaran weke ‘Bavê Folklorê ‘ tê binavkirin . Thompson  Emerîkî ye . Ew dî sala 1885 ‘an de li Bloomfîeld , Kentucy hatîye dinyayê . 1976’an de koça xwe ya dawî kiriye.*[5] Thompson piştî gelek xebatên akademîk li zaningeha Indiana profesorî kiriye . Bi van xebatên kû kiriye hiştiye kû folklor weke zanistekê bê pejîrandin û rêya folklornasan dî nav qada neteweyî û ya navneteweyî ronî kiriye. Xebata wî ya kû herî navdar ‘ The Motif- Index Of Folk Literature ‘(Nimînoka Li Ser Motîfên Wêjeya Gelêrî) çavkanîyeke gelekî giring e . Armanca Thompson ewe kû berhemên folklorê bên tomar kirin û polînkirin . Dî derbarê armanca xwe de Thompson dibêje :

*“Ev kar hewildaneke ji bo polînkirinê ye. Dema ku min ev amade kir, min xwest bi rêzikên basît pêdiviyan aşkere bikim û tiştekî ku kêrî hemû kesî were amade bikim. Li gorî vê planê her çiqas carinan tiştin sedî sed rûneniştibin jî, motîfên li ser mijarekê bi hev re hatin komkirin. Tu hewildanê tespîtkirina bingeha psîkolojîk a motîfan an nirxên wan ên binyadî di nav vegotinan da nehatiye kirin. Min tenê xwest pergalekê ava bikim ku bi kêrî praktîzekirin û rêzkirina çîrok û mîtan were”*[6]

Bi vî awayî Thompson 1923 ‘an de dest bî vê xebatê kiriye ,di navbera 1932-1937 ‘an de ev xebata xwe ya şeş bergî çap kiriye . Ev xebat lî ser cureyên devkî û nivîsî  hatîye kirin . Çîrokên kû hatine analîz kirin çîrokên çanda Hînt-Ewrûpa ne. Thompson di vê xebata xwe de ji 4500 bêhtir motîf derxistine . Bîst û sê beşên sereke ji ‘A.Motîfên Mîtolojîk’ heya ‘Z.Komên Motîfan ên Curbicur’ li gorî rêza alfabetîk hatine rêzkirin. Lê çend tîpên wekî “I, O û Y” ji bo tevlihevî dernekevin bikarneanîne. Pîştî vê xebatê di xebata xwe ya bînavê ‘The Folktale ‘( Çîrok ) pênaseya motîfê daye . Li gorî Thompson jî motîf xwedî qabîliyeta domdariyê ye û beşa herî biçûk a çîrokê ye. Ji bo pêwistiyên vê qabîliyetê motîf divê xwedî taybetîne balkêş û derasayî be. Ji bo vê Thompson li ser sê beşên sereke disekine: *“Beşa yekemîn kes in: xweda, ajelên derasayî, afirindeyên derasayî (sêhrbaz, dêw, perî, ferîşte...) ûhw. Duyemîn tiştên ku li paş bûyeran de dimînin: eşyayên derasayî, adetên ecêb, bawerîyên ecêb ûhw. Ya sêyem jî bûyerên serbixwe ne.*[7] Di ve pênaseyê de xuya dike kû Thompson tiştên ji rêzê weke motîf qebul nake.

[5]www.wîkîzero.înfo , Stîth THOMPSON:2 July 2017
[6]Thompson, 1955:10 ) ( Bûnyamîn DEMÎR – Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stîth Thompson, s.10, 2016 , Mêrdîn
[7]Ayşegül YILDIRIM , Masallarda Büyü Motifi İle Gerçekleşen Motifler s. 13. Samsun 2016

# 3. LÎSTEYA MOTÎFAN

Thompson motîfên kû kom kirine beş û binbeş, Ji bo her komeke motîfan tîpeke alfabeyê bi kar aniye. Li jêr me hewl da derbarê her beşa sereke ya motîfan de agahîne kurt bidin .

## 3.1.Motîfên Mîtolojîk

Motifen ku di bin tipa A'ye de hatine komkirin derbare siruşta xwezayê û gerdûnê ye . Pergala jiyan u civaka miroven kevnar de ne. Herwiha motifen derbare destpeka jiyane, afirandin u sazkirina dinyaya ajel u nebatan de ji di ve beşe de cih digirin.

**A0-A99. Afirîner**

A10. Xwezaya afiriner

A13. Afirineren ajel

A13.2 Afirineren balinde

A13.2.1. Eyloye afiriner

## 3.2. Ajel

Ji bili ajelên mîtolojîk kû di bin tîpa A 'yê derbas dibin motifen , hemu motifen derbare ajelan di bin ve tipe de hatine komkirin. Di bin ve beşe ajelen sehri u ajelen çarlingî ê sehrî hene .

**B100-B199. Ajelên sêhrî**

B180. Ajelen carlingi yen sehri

B184. Ajelen simdar en carlingi yen sehri

B184.1. Hespe sehri

B184.1.3. Hespesehri ye ji dinyaya avi

### 3.3.Qedexe

Di ve beşa motifan de tişten qedexekiri hene. Ev beş qedexeyên din av civakê de jî dihebîne .

**C100-C199. Qedexeyên cinsî**

C160. Qedexeya derbare zewace de

C162. Qedexeya zewaca bi keseki/a diyar re

C162.1. Qedexeya zewaca bi banûya nijadeki diyar re

C162.1.1. Qedexeya zewaca periye bi keseki fani re

### 3.4.Sêhr

Sehrên kû di çîrokên derbas dibin di bin vê beşê de ne .

**D800-D1699. Heyberên sêhrî**

D1300-D1599.Fonksiyonen heyberen sehri

D1300. Heybera sehri zanatiya derxwezayi dide

D.1300.1. Şewqe zanatiya sehri dide

### 3.5.Mirî

Di nav edebiyata geleri de hêmana mirinê gelekî berbelav e . Ji bili wê di bin ve beşê de em dikarin hêmanînê bê çawa miri vedijin jî bibînin..

**E0-E199. Vejandin**

E64. Vejandina bi heybera sehri

E64.3. Vejandina bi zingila sehri

E64.3.1. Vejandina bi zingila kesê piroz

### 3.6.Derasayî

Ev beş û beşa D. Sehr dişibin hev lê ne yek in . Asayên bi sehr em dikarin di bin beşa sehrê de bibînin lê perî , şeytan em nikarin weke sêhrê bibinin . Ew hêmanên derasayî ye . Giredana wan bi rasteqîn u xwezayê heye .

**F0 – F199. Rêwîtiyên dinyayên din**

F0. Rewitiya dinyaya din

F10 – F79. Dinyaya jorin

F10. Rewitiya dinyaya jorin

F10.1. Vegera ji dinyaya jorin

### 3.7.Hût

Hût ji bo wateya cenawir û merivxuran hatiye bîkaranîn .

**G10– G399. Cûreyên dêwan**

G10– G99. Merivxwir u merivxwiri

G10– G49. Merivxwiriya domdar

G10. Merivxwiri

G11. Cureye merivxwiran

G11.4. Ava merivxwir

### 3.8.Ezmûn

Gelek caran di çîrokan de ji bo kû leheng tiştekî bidest bixe divê di ezmunan de derbas bibe .

**H0– H199. Ezmûna nasname: nasîn**

H80– H149. Nasina bi heyberan

H110. Nasina bi cil u bergan

H114. Nasina bi lepik

**3.9.Zane û Behle**

Lehengên jîr û şareze bi zanebûna  xwe an hinekadin  xwe ji pirsgirêkan xelas dike

**J1100– J1699. Zîrektî**

J1100– J1249. Kesen şareze u tevgeren wan

J1110. Kesen şareze

J1115. Pişekaren şareze

J1115. 10.Revebiren şareze

J1115. 10.2. Weziren şareze

**3.10. Xapandin**

Dî çîrokan de motîfa xapandin.zêde ne . Thompson rizgarbûna bi xapandine jî di bin ve beşe de rêz kiriye .

**K0– K99. Serketina pêşbirkê bi xapandinê**

K10. Di peşbirka atletiki de bi xapandine serketin

K11. Di peşbirka bazdane de bi xapandine serketin

K11.1. Di peşbirka bazdane de bi xapandine serketin: nasen arikar

**3.11. Berevajîbûna Çarenûsê**

Di çîrokan de leheng gelek caran serpêhatiyên dijî taybetîyên xwe an civakê dijî. Bi vî awayî çarenûsa wî diguhere .

**L0– L99. Zarokên serketî yên herî biçûk**

L0. Zaroken serketi yen heri bicuk

L10. Kure serketi yen heri bicuk

L10.1. Naven kure serketi en heri bicuk

L10.1.1. Sezdeh weki nave kure serketi e heri bicuk

## 3.12. Tayînkirina Dahatûyê

Di ve beşe de kehanet, peşdîtin, sond, soz, lanet û nifir ji cih digrin.

**M300– M399. Kehanet**

M310. Kehanetên baş

M311. Kehanet: Dahatuyeke pir rewnaq ji bo zaroken he cenebuyi

M311.4. Kehanet: zaroke he cenebuyi dê bibe mîr

## 3.13. Şens û Bext

Şens di vegotinen gelerî de ciheki giring digire. Di nava vê beşe de motifen derbarê qumar, xwezaya şens u bext, qezayen bişens u beşens, gencîne u kesên arîkar de cih digirin.

**N800– N899. Arîkar**

N800.Arikar

N810.Arikaren derxwezayi

N812. Hut an dewen arikar

N812.3. Hute arikar

N812.3. Hute minetdar weki arikar

## 3.14. Civak

Ev beş taybetmendîyên civakê pêşberî me dike .

**P200– P299.Malbat**

P200.Malbat

P230.Zarok u de u bav

P231. De u kur

P231. Kur dayika xwe hişyar dike

### 3.15. Xelat û Ceza

Çîrok gelek caran bi serkeftin û xelatgirtina leheng u cezakirina kesên xerab bi dawi dibin.

**Q0. Xelat û Ceza**

Q10– Q99.Karen xelatkiri

Q20.Dindariya xelatkiri

Q22. Xelata ji ber baweriye

### 3.16. Girtî û Firar

Di cirokan de gelek caran mirov an tên esirkirin. Awayê esîrbûn û ji vê esîrbûna rizgarbûn di bin vê beşê de hatîye komkirin .

**R0– R99.Girtîbûn**

R10.Revandin

R10.1. Prensesa revandî

R10.1. Prenses ji aliye leşkeran ve tê revandin.

### 3.17. Zordariya Neasayî

Ev beş derbare tevgeren pir dijwar en zordaran de ye. Di vir de demariyen an zirbavên zordar,mîrên xerab , kuştinen pir xerab cih digirin.

**S0– S99. Nasên xedar**

S60.Hevseren xedar

S62. Mêrê xedar

S62.1. Mêrê jinkuj

### 3.18. Zayend

Evîn ,zewac, keçikbûn, zarokanin u mezinkirin, tekiliyen cinsî di bin ve beşê de hatine komkirin.

**T0– T99.Evîn**

T10.Dilketin

T11.Dilketina kesê/a qet nehatiye ditin

T11.Dilketina bi dîtina wêne

### 3.19. Xwezaya Jiyanê

Di derbara rêzên jiyanê de agahiya dide me . Ev beş di pergala jiyanê de dersên serpêhatîyê pêşberî me dike .

**U0– U99. Newekheviyên jiyanê**

U60. Dewlemendi u hejari

U66. Her kes te kirin

U66.1. Her jin te kirin

### 3.20. Ayîn

Behtir di derbarê rituelen dini de ne weke nimej, nimêjgeh baweriyen dinî di bin vê beşê de hatine rêz kirin .

**V0– V99. Xizmetên dînî**

V70.Roji u cejnen dini

V70.4. Cejna çinîne

### 3.21. Taybetmendiyên Karakterî

Ev beş li ser du cureyen tevgeran ve hatiye komkirin . Taybetmendiyên lehengan ê baş û ê nebaş

**W100– W199. Taybetiyên karakterî yên nebaş**

W110.Taybetiyen karakterî yen nebaş – takekesî

W111. Tirali

W111.1. Pîleya tiraliye

W111.1.1. Kese ji ber bixwereneditînê linge wi dişewite

## 3.22. Pêkenî

Di ve beşe de heneken derbarê zayend, rewşa civaki, netewe, dirûv, kêrnehaîibûn, derew, mezinkirin u serxweşbune cih digrin.

**X200– X599. Pêkeniya derbarê çînên civakî de**

X300– X499. Pêkeniya li ser pîşeyan

X410. Heneken li ser keşeyan

X414. Keşe di dere de li ga siwar dibe

## 3.23. Komên Motîfan ên Curbicur

Motîfên kû di bin beşên din kêm mane di bin vê bêşê de hatine komkirin .Di bin beşa Z’ye de tişten weki jimaren ku pir ten bikaranin; sembolizma rengan di bin beşa Z’ye cih digirin.

**Z100– Z199. Sembolîzm**

Z140.Sembolizma rengan

Z142. Rengê sembolik: spî

Z142.2. Spî weke sembola şehîdbune

# 4. ÇÎROK Û MOTÎFÊN WAN

## 4.1. HEMHEMONUK

Go carî bî hemhemonuki hebî, go carê diço behmêrê dori yo hêjîro go bi teht kê ve bî, go diço guhê wê hêjîrê ji xwe ro hêjîr dixwarin.

Go pîro mirovxwer jî hebî û go du keçê pîrê jî hebîn. Go her ru pîrê ji xwe ro diço ref û nêçîrê.

Go rujkê hot nêrî yo Hemhemonuk li sirê hêjîrê ye. Go pîrê got; Kurê mi tu çitkê li wê dê? Go Hemhemanuk go wilo ez hêjîro dixwem pîrkê. Go Hemhemanuk zanî pîrê mirovxwere, go robî mizgir bi hêjîro do û avêtin jêro. Go pîrê go; Kurê mi çiqo şûr in. Go Hemhemonuk got; Pîrkê destê mi xweh doye gey ji wê ye. Go pîrê go: No willah kurê ev şûr in. Ko were were nê evên vî çeqlê he çiqo gelkin. Were vî çeqlê nivskê pîrko te yê destê xwe bovîjyî. Go çiwo Hemhemonukê gewr hot ser wî çeqlê destê pîrê negihoyî. Go hemo lingê wî girt û ovêt tûrkê xwe do, bir. Go bi rêve mîzê pîrê hot. Go tûrkê xwe doni wê dê, go ezê biçim mîz bikem. Go heto pîrê ço mîz bike Hemhemonuk bero bongeri kir tûrkê pîrê do û bozdo ço. Go pîrê rohişt tûrkê xwe ço doqene biçi mol. Welî keyfo wê dihot, digot; mi yêk oniye heto kengê tîro me heye em bixwê. Li tûrik nonêri bongere tîdo diçi mol dibîji; Fot fotuk ,Eyş Eyşuk erin mi ji he we ro biroyi oniye. Go wo jî derî vekir. Go pîrê got; Mehfîr û duşeko jî roxin. Go robî pîrê go gurm tûrkê xwe li wê erdê do. Go keçên wê gotin; oho, yodê ne te bongeri oniye. Go pîrê go; xemnoke keçomi emê dênî ser bonê xwe corê pî bigerînî. Go pîrê dilê xwe do digot; mo ewê ji ber destê mi xilos bibi, mo ne ezê wî bigrim.

Go pîro gewr sipê dîso ço tîro xwe ref û nêçîrê geroho go dîso hot nêrî yo Hemhemonuk li guhê wê hêjîrê ye. Go pîrê go; Hemhemonuk kurê mi ko hin hêjîr ji pîrko xwe ro bovîje. Go dîso kurik hot ser çeqlê xworê, go pîrê ew girt û ovêt tûrkê xwe do û bir û ço. Go dîso çiwo pîrê giho wê borê mîzê wê hot. Go dîso ço doqene bi mîzi , tûrkê xwe donî wê dê. Go heto pîrê hot Hemhemonuk sitemboleyi sitirî kir tûrik do û bozdo ço. Go pîrê dîso lez kir hot mol, got; Fot Fotuk, Eyş Eyşuk derî veken mi biroyi ji he we ro oniye. Go nêrîn, biroyê çi sitirîne li tûrkê pîro do. Go pîrê go; de xemnoke emê bidê ber sînçko sirê bîn doqene heywon neçin ser bonê me.

Go rujo siso pîrê dîso ço. Go dîso Hemhemonuk girt go vê corê got; bi Xwidê vê corê ez bi mîzim bi xwe do jî ez wî nodeynim erdê, heto ez biçim mol. Go pîrê hot mol go got; Fot Fotuk, Eyş Eyşuk tenûrê doden, çincîrkê ser tenûrê çêken û Hemhemonuk bêxin tîdo, demo ket çincîrkêdo şerîtê biqetînin bilo bikevi tenûrê do emê bixwê. Go robîn welî çêkirin lê go Hemhemonuk bi oqilbî go got; willeh ez noçim tîdo. Go pîrê got Eyşu; tu here tîdo. Go Eyşu jî piçkê bi oqil bî go wê jî got; willeh ez noçim tîdo bilo Fot Fotuk biçi. Go

robîn Fot Fotuk kirin çincîrkê do, go çiwo kirin tîdo şerît jî qetondin Fot Fotuk ket tenûrê do. Go gotin; Fot Fotuk ket tenûrê bî potuk. Go piştî qederkê Hemhemonuk got; Eyş Eyşuk tu xwe veşîre. Go robî binê molê sobîn do şeykê mişkê onî donî nîvê molê, xwê jî donî bo şeyi. Go demo pîrê hot pêl şeyi kir, go ji lezo hingî pê wê îşo ço pêl xwê jî kir, go ju ço li sobînê jî fiştiqî go gurm piştikî ket erdê qûno wê şikest. Go pîrê got; derbi xweş e yêk di jî. Tu nobîjî heke derbi di li pîrê biden yê sox bibi. Hemhemonuk bi oqil bî lî nedo, go pîrê mir. Go Hemhemonuk û Eyş Eyşuk tişto li molê heyî ji xwe ro don hev û birin, çon.

**Çavkanî:**Rabia B. ; Cihê çêbûnê û emrê wê: gûndê Xursê girêdayî Basa ya Şirnexê ,45; perwerde: nexwendiye; kar: kebanî.

### 4.1.1. Motîfên Çîroka Hemhemonuk De

1- **B - Ajel**

Lehengê me hemhemonûk ajelek e.

Hemhemûnok şeyka mîşkê didêne . Mîşk motîfa ajela ye .

2- **G-Hût**

Lehengê me hemhemonûk ajelekî mirovwir e.

3- **X- Pêkenok**

Hemhemûnok hejirê kû bi ser de mîz kiribû diavêje ser pîrê. Pîrê dibêje çiqasî şor e. Encama çîrokê de pîre dikeve qûna wê dîşke.

4- **L – Berawirdkirina Çarenûsê**

Pêşî pîre dixwaze hemhemûnokê bixapîne lê di dawiya çirokê de çarenûs diguhere û hemhemûnok bi ser dikeve.

5- W- **Zane û Behle**

Di çîrokê de derbas dibe kû Eyşû û Hemhemûnok biakilin.

6- R-**Girtî û Firar**

Pîrê hemhemûnok dixe tûrikê xwe û direvînê.

7- **K-Xapandin**

Pîrê dibeje hemhemûnok were ser çiqle din . Bi vî awayî wî dixapîne bidest bixe .

8- **E- Mirî**

Dawîya çîrokê pîrê dimire .

9- **V- Ayîn**

Peyva willeh û xwedê motîfên olî ne .

10- **Z- Komên Motîfan En Cûrbicûr**

Navên keçê pîrê Fot Fotûk û Eyş Eyşik in . Ev jî navên Kurda ne .

## 4.2. HOCÎLUK

Go corkê keçkuki done mêr, molo wo li sirê gunde. Keçik done molo momê wê wo. Co keçkê dibîji; ezê ji te ro herim bojêr doqene tiştno ji cihozê te ro bînim. Go wî heyomê Hocîluk hene, insonin lê welî xesifîne, insono dixwen. Go co keçkê piçkê ji gund dûr dikevi dinêri yo Hocîluki ji wî ve tê ye. Go co keçkê ji tirso dibîji; Hocîluk tê rê kû dê? Go Hocîluk dibîji; wilo ezê herim vî gundê he. Co keçkê dibîji; mo tu molo hino nos dikê? Ji tirso ro, dibîji hemo des mi ne debes. Hocîluk dibîji; no wilo ez molo kes nosnokem. Co keçkê dibîji; nexwo here molo me. Molo me li sirê gunde Fot Fotuk keço min e, niho çoye doro, mi mefte jî kirye bin tevşkê kulkê do. Go Hocîluk diçi molo wo. Meftê dibîni, derî vedike diçi xwe dike mol ve. Xwe dike seftko meyjo do.

Co keçkê ji xwe çoye bojêr, go Fot Fotuk jî nîrvu ji doro hot. Go bilez ço poryi non xwor. Go ço got hovolên xwe; îşiv werin cem me co mi ne li mole emê heto sipê ji xwe ro dulovê bi rîsî. Emê ji xwe ro heneko bikê heto sipê em norozêyî. Go şeş heft keçik gihon hev îvorê çon cem molo wo. Go kêlîkê dulovo xwe ristin. Go keçiko gotin; hovolê mo tu tiştkê noynî em bero bixwê. Go Fot Fotuk got hovolo xwe; de hemo here we seftko meyjo yo li wê dê ye, vê bijingê bibe tijî meyj bike were. Keçko hovolo wê diçi dibîji ezê hin meyj bînim. Vêco weke cehviyo tenûro qul li seftko hene. Keçi destê xwe têxi wê qulê do doqene meyjo bîni, Hocîluk guncîrkikê li destê wê dide. Keçik dibîji; Fot Fotuk, wilo tiştkê guncîrki li destê mi do.Fot Fotuk dibîji; de here lê, tu çiqo tirsunekî qey duvkê meyjoye li destê te ketî. Ko hilîne ezê bînim. Go demo Fot Fotuk diçi dibîji ezê meyjo bînim, Hocîluk hêlkû gunê xwe vnoke desto do. Fot Fotuk dide ber qêro, ew û hovolên xwe boz diden derdikevin ji derve û derî digrin. Hocîluk dimni li mol ve. Fot Fotuk diçi sirê bîn li kuleko bîn do dinêri ko Hocîluk çi dike. Dinêri yo Hocîluk tifi pîxistiye, ogir kirye. Hocîluk bi molê dikevi ko dohnê wo li kûdê ye. Miqilki dohn dotîni ser îgir. Her wî dohnê li hêlkû gunê xwe dide û dibîji; Fot Fotuk donyo rûke,kêr girêde, wer berê Hocîreşk. Molo momê Fot Fotuk ne geli dûre ji wo. Zorukên wo dibîjin yodê wilo dengi tê ye. Go jinkê sirê xwe li kulê kê ro deronî nêrî ve Fot Fotuk yo tiştno dibîji. Go jinik dibîji; rebeno wilo miro dibîji hin hotine Fot Fotukê. Go pismomê Fot Fotukê têne dibîjin; keçê çibiye Fot Fotuk? Go ew jî dibîji; de ko mol ve binêrin. Go nêrîn Hocîluk bi nîvê molê ve tê û diçi, hemo dohn li hêlkû gunê xwe dide. Go pismomê wê diçin Hocîluk dikûjin. Go vêco co keçkê ji bojor tê dibîji; Fot Fotuk keço mi tu ne tirsoyî vo rujo?

Go Fot Fotuk dibîji; no mo ezê ji çi bitirsîm? Go co wê dibîji;wilo mi li sirê gund Hocîluki dît, mi hulî gotî, mi go heye ew hoti bi te. Go Fot Fotuk tîro co xwe dibîji û çêruko me xilos dibi.

**Çavkanî:**Rabia B. ; Cihê çêbûnê û emrê wê: gûndê Xursê girêdayî Basa ya Şirnexê ,45; perwerde: nexwendiye; kar: kebanî.

### 4.2.1. Motîfên Çîroka Hocîlukê De

1- **G- Hût**

Hocilûk cûreyekî hûta ye .

2- **P- Civak**

Pîrê dîçe bajêr ji bo kû cihaz ji keça xwe re bistîne . Hêmana çeyîzê hêmanek civakê ye .

Pismamtî û têkîliya di navbera dê û keçê nîşaneyên civakê ne .

3- **T- Zewac**

Pîrê keça xwe daye dê wê bizewcîne .

4- **W- Zane û Behle**

Pîrê wextê kû Hocîlok dibîne gelekî ditirse û bêakiliyê dike wî dişîne mala xwe.

5- **K- Xapînok**

Hocîlûk quncir dide destê keçikê ji bo kû jê dur bikeve .

6- **N- Arîkar**

Pismamên keçikên tên bi hewara keçikê ve û wê xelas dikin.

7- **Z- Komên Motîfên Ên Cûrbicûr**

Fot Fotuk weke navê keçkê Kurdan dî çîrokê de derbas dibe.

Şeş, heft keçik kom dibin . Ev jimare weke sembolan pêşberî me bûne .

### 4.3. GUHRETEL

Go cori bî jin û mêri bî zorukê wo çênobîn. Go heru zelom diço doro û jini tinê dimno li mol. Go rujkê dîso zelom ço doro. Go got jino xwe; keçê ezê biçim doro vî dîkê bibe bilo comêri ji te ro şerjîke ji me ro bike şîv. Go jini dibîji; bilo, ezê çêkem. Go mêrik ço doro, go jinik jî dîkê xwe bir cem comêrkê go jê ro şerjîkir. Go jinkê onî mol pirtikond. Go xwidê welî kir dilê jinkê do, robî ew dîk nov pêçekê werdo û kir mehdkê do nixwimond, runişt berdo hîjond. Go mêri ji doro hot. Go corê demo mêri ji doro dihot, jinik diço pîşyê digot; qiwet bi ji te ro,ehrî wî dikir. Go mêri dorê xwe donîn,çend dengo bonkir jino xwe kes nehot. Go got;keçê ev xîre, çi qewmiye tu dernokevî, ehrî mi nokê. Go jinkê go; de here lo ev kurkê bigrî. Go mêri go; keçê kurê çi? Go jinkê go; îru xwidê kuri doye mi. Go mêri go; mo ne ez sipê çom tu tişt nebî, mo ev çiwo çêbî. Go mêri hot kincikê ser mehdkê hilonî nêrî yo xwidê ji wo ro kirî kuri ew dîk. Go kuri mezin bî welî bi oqil bîi go heru keçkên cîronê wo têne dibîjin; xoletê ko bonke Guhretel bilo bê emê ji xwe ro biçî doro. Welhosil go novê kuri kirin Guhretel. Go heru bi hev ro diçin doro. Go rujkê dîso çon doro, her Guhretel her ji wo ro sitron gotin hingê nêrîn bî şêv. Go ko borê xwe çi kiribin rohiştinî çon, go nêrîn ji dûrve yo rohniyo ogir dibiriqi. Go Guhretel û keçik bi hev ro çon qesto ogir kirin, nêrîn yo pîro mirovxwere, duçemluki guşt donye ser ogir û bilbilo wê ye dikeli. Go pîrê go; şîbimbim bêhno biyonyo tê. Go pîrê wê şêvê guştê wê heye dibîji; ko he we şîv xoriye? Go gotin no wilo me şîv nexworiye pîrkê. Go îdi nikorin xwe ji destê pîrê xilos jî ken. Go robî şîv do wo. Welhosil du sê şêvo şîv do wo. Lê go ovo pîrê nebî ovê bide wo. Go diço di mizt û dikir zerkê do tonî dido wo. Go digotin; pîrkê çiqo ovo te şûre. Go pîrê di got ; kurê mi wilo ev e , wekî di ov nîni. Go nedigot wo mîzê min e. Go pîrê go; mo nexwo hun çi ovê vedixwê kurê mi? Go Guhretel go; mo em hulî pî qedrî wilo co me ovê li serodê dike,bijingê dike,muxilê dike nûko dide me. Go pîrê go; ko ji kûdê tîni were em biçî ovo welî ji he we ro bînî. Go wê û Guhretel rohiştin serodê, bijingê û muxilê çon ber çem. Go pîrê li ber qeroxo cem go ezê ovê dogrim. Go Guhretel go; pîrkê mo ev ov tê vexworin, ew pêl pêlûko he yo spî , çiqo ovo wê niho xweş e. Go robî pîrê bi nov ovê ve ço , go pêlo spî li pîrê do, pîrê li ber xwe bir û ço. Go Guhretelê gewr hot heft borê hêstiro ji molo wê pîrê bor kirin, bir ji xwe ro û çon mol.

**Çavkanî:**Rabia B. ; Cihê çêbûnê û emrê wê: gûndê Xursê girêdayî Basa ya Şirnexê ,45; perwerde: nexwendiye; kar: kebanî.

### 4.3.1. Motifên Çîroka Guhretel De

1- **B- Ajel**

Jinik ji bo şîvê dîk têne lê dîk je re dibe zarok.

Guhretel hêstirên pîre dibe û diçe.

2- **W- Taybetmendî**

Bavê guhretel yekî camêr e.

3- **G- Hût**

Pîra mirovxwer dî çîrokê de lehengeke din e.

4- **J – Zane û Behle**

Guhretel mîrovekî biakil e.

5- **P- Civak**

Têgehê jin, mêr û kur hêmanên civakê ne .

6- **L- Berawirdbûna Çarenûsê**

Malbata di çîroka me de zarokan wan çênabin . Lê bî awayekî sêhrî dîkê wan ji wan re dibe kur .

7- **V-Ayîn**

Xwedî dixe dilê jinikê kû wî dîkî bixe pêçeke. Tegeha Xwedê motîfeke olî ye .

8- **R- Girtî û Fîrar**

Pîra mirovxwer Guhretel û keçikan digire . Nahele kû herîn mala xwe.

Guhretel ji ber şareza ye ji destên pîrê xwe keçikan xelas dike .

9- **E- Mirî**

Pîra mirovxwer dikeve avê û dimire .

10- **Z- Komên Motîfan Ên Cûrbicûr**

Guhretel piştî kû ji destê pîrê xelas dibe heft hestiren we ji xwe re dibe . Hejmara hefta motîfek e.

Pîrê wextê diçê ser avê pêleke sipî lê dikeve û li ber xwe dibe . Rengê sipî di vir de motîfeke rengan e.

**ENCAM**

Analîza S. Thompson ji bo hemû cureyên edebiyata gelerî nemaze çîrok werin fêm kirin, bingeha wan were dîyar kirin , cihê wan ê kû di dinyayê de were dîtin xebatek bingehîn e . Bi rêya vê xebatê em dikarîn çîrokên xwe û çîrokên gelên din berawird bikin û cudahî û wekhevîyan wan derxin holê . Her çiqas me di vê xebatê de rêbaza S. Thompson ji bo nirxandina çîrokan tenê bi kar anî be jî ev rêbaz ne tenê ji bo çîrokan ji bo hemû berhemên edebîyata gelerî hatiye bikar anîn û di vî warî de rêbazeke girîng e.

Rexneyên kû li ser vê xebatê jî hene . Li gorî Alan Dundes: *Dîvê kû folklornas weke zanistekî tevbigere û sansurê nexe xebata xwe de*[8]. Lê Thompson bizaneyî motîfên derbarê têgehên mustehcen û pêrewan ( ghost entrîes ) gelekî kêm agahî dane . Ev tevger weke astengekê derdikeve ber lêkolîneran .

Em di xebata xwe de li ser sisê çîrokan sekinîn. Her sisê çîrokên me jî ji berk u aîdî herema Botan in bi botîkî hatine nivîsîn . Me motifên kû di çirokan de tespît kirin û di îndeksa motîfan ya S. Thompson bicih û binav kirin . Her sisê çîrokên me de motîfên hevpar gelek bûn Di encamê de em dikarin bibêjin çîrokên me bi kêmasî an jî xerabiyekê destpê kirine lê çarenûs guherî ye carna lehengên nebaş carna jî lehengên baş di dawîya çîrokê de serkeftin bidestxistine .

[8]Motif İndeks ve Masal Tip İndeksi: Bir Değerlendirme ,Alan Dundes çev. Tolga ÇETİNKAYA s. 133

**ÇAVKANÎ**

1- BALCI,Serkan .*Yayılım Alanlarıyla Bir Masal ve Versiyonlarının Motif İncelemesi* , (Kafkas Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü-Teza Neweşandî ) ,Kars :2014

2- BOZDOĞAN,Merve .*Türk Halk Hikayelerinde İmtihan Motifi*,( Niğde Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü -Teza Neweşandî), Niğde : 2013

3- DEMİR, Bünyamin .*Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stîth Thompson* (Zanîngeha Mêrdîn Artûkluyê Teza Neweşandî), Mêrdîn : 2016

4- DUNDES,Alan (2010 ).*Motif İndeks ve Masal Tip İndeksi-Bir Değerlendirme, Milli Folklor,* Werger: Tolga Çetînkaya ( Kovar , jimar : 39 rûpel 133 )

5- EKİNCİ, Muzaffer , *Lêkolîneke Li Ser Lawiran Kû Di Berhema Mehmet Emîn Bozarslan Ya Rêzeçîrokên A Bi Navê 'Meselokên Lawiran ' Derbas Dibin,* ( Zaningeha Mûş Alparslan Enstitüya Zimanên Zindî -Teza Neweşandî),Mûş : 2014

6- PROPP, Vladimir ( 1985 ). *Masalın Biçimbilimi,* Çapxane: Kent Basımevi/ İstanbul, Werger: Mehmet Rifat- Sema Rifat.

7- YILDIRIM,Ayşegül .*Masallarda Büyü Motifi ile Gerçekleşen Motifler* , ( On Dokuz Mayıs Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü- Teza Neweşandî ), Samsun: 2016

8- www.wikipedia.înfo , Stîth THOMPSON:2 July 2017

9- Kesên Vegoter ( Çîrokbêj ) : Rabia B. ; Cihê çêbûnê û emrê wê: gûndê Xursê girêdayî Basa ya Şirnexê ,45; perwerde: nexwendiye; kar: kebanî.

T.C
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ ve KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI
TEZSİZ YÜKSEK LİSANS BİTİRME PROJESİ

# BULMUŞLAR KÖYÜ ( ŞIRNAK ) KÖYÜNDEN HALK MASALLARI ve MOTİF İNCELEMELERİ

Latife ATAY
16721018

Danışman
Yard. Doç. Mustafa Aslan

Mardin-2018